

# R'OJEVA K'URDÎ YA CÎHANÊ, PÊVAJOYA AŞTÎYÊ Û PÊŞK' EVTINÊN SÛRÎYAYÊ!

Ezîz ê Cewo

... Îro Pirsgirêka k'urdî li ser astên cuda di r'ojeva cîhanê da ye – ji R'êxistina Net'ewên Yekbûyî (R'NY/UN), DYA û dewletên ewropî girtî heya bê-derê Çîn û R'ojhilata Navîn! Û ji bo vê jî du sersedem hene: ya yekem banga r'êberê gelê k'urd bir'êz Ocalan a 'Aştî û Civaka Dêmoqratik' e, ya duyem – pêvajoyên Sûriyayê yên piştî têkçûna r'êjîma baasî û r'êyên ç'areserîya pirsgirêka k'urdî ye, di wî welatî da...

## 1. P'EYAMA R'ÊBER ABDULLAH OCALAN! –MIROV DIVÊ WÊ ÇAWA BIXWÎNE?



Banga dîrokî ya r'êberê gelê k'urd bir'êz Abdullah Ocalan a 'Aştî û Civaka Dêmoqratik' di cîhanê da deng veda û r'ê li pêşîya govtûgo û gengeşîyên cuda vekir. Lê li vira ya here girîng ew e, ku hem R'êxistina Net'ewên Yekbûyî (R'NY/UN) û dewletên cîhanê yên hêgêmon ev bang erênî nixandî. Û, her çi qas, jêdera van nixandînan xwe dispêre konyûktûra pêkhatî, ya ku bi hewlên r'êjîma T'irkîyayê di nava hevalbendên wê yên NATO -yê da hatîbûye avakirin (qaşo, ya têk'oşîna dijî tê'orê!?), dîsa jî evê dengevedanê jinûva bala civaka navnet'ewî vege'and ser pirsgirêka k'urdî, û li ser astên cuda (ji dewletên bi bandor girtî heya bê-derê R'êxistina Net'ewên Yekbûyî) guvtugoyan destpê kirye. Û eva jî hêvîyekê dide, ku dawîya dawîyê dê di nava sazî û r'êxistinên navnet'ewî û r'êvebir û r'ayedarên dewletên cuda ên cîhanê da ji bo r'ast têgihîştina pirsgirêka k'urdî bîngehek a obyektîv bê avakirin – ku têk'oşîna gelê k'urd, hewl û hemleke r'ewa û mafdar e, ji bo mafên xwe yên mirovî û net'ewî – li dijî tê'ora dewletê.

Di nava civaka k'urdî da jî li hember vê bangê helwestên cuda r'û dane, yên ku li ser asta hestyarî ava bûne (çi qas mirov, ewqas nêr'în – her yek cîhanê wek xwe dibîne!), di vê derbarê da di medya civakî da govtûgo û gengeşîyên cuda pêk tên. Û ya sereke jî, ya ku di Bangê da zêde bala wan vediger'andye ser xwe, ev gotin in: “... *hûn jî bi dildarî kongrêya xwe bicivînin, bir'ayan bigirin, divê hemû k'om ç'ekên xwe daynin, û Partîya K'arkerên K'urdistanê (PKK) xwe fesih bike*”. – Bi r'astî jî, dema mirov t'enê, cuda, derî kontêk'stê wan gotinan dixwîne, yan dibihê, dixwaze bipirse: “Çima?! Çawa?! Ma, wisa dibe?!” – . Lê bala xwe bîdîne, berî van gotina çi heye: “*Wek ku her civak û partîyek a hemdemî, ku hebûna wê bi darê zorê nehatye dawîkirin, ...*” – angû bi darê zorê, t'u hêzek nikare PKK-ê dawî bike!

Ev yek!

Ya dinê, bala xwe bîdîne, hê berî van gotinan bir'êz Ocalan çi dibêje: “...*R'êzgirtina*”

*nasnameyan, azadîya r'amanê, r'êxistinbûna dêmokratîk, avakirina civakî, aborî û siyasî ya hemû pêkhatîyan t'enê bi hebûna civak û qada siyasî ya dêmokratîk dikare hebe. **Sedsala k'omarê ya duyemîn t'enê, dema ku bi dêmokrasi bê t'acîdarkirin, dikare bibe xwedî yekîtî û berdewamîyeke mayînde.** (Bi t'aybet bala xwe bidine vê hevokê! – E. C.). *Ji dêmokrasiyê pêva t'u r'eyeke dinê ya lêger'îna p'ergalan û pêkanîna wan nîne, ne mumk'ên e...*” – Û ev jî p'eyamek e, hem ji bo r'êvebirîya T'irkîya îroyîn, ji bo ku veguhar'tinan pêk bîne û merc û derfetên pêwîst biafirîne, hem jî ji bo r'êvebirîya PKK-ê, ji bo ku anegorî van mercan t'evbiger'e û gavên pêwîst biavêje!*

Em dibêjin vê qasê, ji bo destpêkê ewqas bes e, emê hê bi hûrbînî li vê pîrsê vege'rin...

Lê, dîsa jî, li vîra divê bê gotin, ku divê Banga R'êber Ocalan ji daxwîyaniya R'êvebirîya PKK-ê cuda neyê nirxandin, ew herdu hevdu t'emam dikin û destpêka r'êya ç'a-reserîyê destnîşan dikin.

Naha em bîna ser helwesta r'êvebirîna r'êjîma K'omara T'irkîyayê.

Helbet, helwesta r'êvebirîna r'ayedarên r'êjîmê û çapemenîya girêft'erî wê tê zanîn: ew pîrsgirêkê di nava kontsêpta, qaşo, “*t'êkoşîna li dijî t'êr'orê û t'êkbirina wê*” da r'aberî r'aya giştî dikin, lêbelê, civak êdî di nava t'êkoşîna li dijî t'êr'ora dewletê da ewqasî bi siyasî p'erwerde bûye, ku dizane, ç'avkanîya t'êr'orê û hemû bedbextîyên gel û welatê wan r'êjîm bi xwe ye, û dijwar, r'êvebirîna r'ayedarên wê bixwazîna t'êr'ora dewletê t'une bikin, lewra ku, ya ku wan xwedî dike û li ser p'êyan dihêla jî, t'êr'ora dewletê bi xwe ye...

Lewra jî li vîra pîrsê dertê holê: “*Ma, gelo ev kesên ku vê r'êjîmê r'êva dibin, dê bikaribin ji pêvajoya aşîyê r'a bibin bersîv?*” – Û bersîva vê pîrsê jî êdî di daxwîyaniya serokk'omarê K'T' R'eceb T'eyîp Erdoxan da dide der, a ku wî piştî Banga R'êber Ocalan pêk ane.

Bala xwe bidinê, ew çawa di vê navberê da derdik'eve û evê pêvajoyê bi r'engekî lêpovajîkirî dinrxîne û r'adigihîne, û hemû k'irêtî, dijmirovî û sûck'arîya siyaseta vê r'êjîmê li ber r'aya giştî radixe. Ew hewl dide, bide bawerkirin, ku *...di vê r'êya li pêşîya wan da derfeta avîtina pêngaveke dîrokî heye, ku armanca wê r'akirina wî dîwarê t'êr'orê ye di navbera biratîya wan (ango, ya t'irk û k'urdan – E. C.) ya hezar salî da, ji t'êkbirina wê lîstîka veşartî û qir'êj, ku ev dused sal in, împêriyalîzm li vê erdnîgarîyê pêk tîne, ne t'enê welat û welatîyên wan, lê wisa jî t'evahîya herêma wan dê xêrê jê bibîne. Ku ev daxwezî û hewlên împêriyalîst, ên ku van demên dawîyê bêhtir bêar bûne, û hemû trajêdîyên mirovî, ku li ber ç'avê cîhanê pêk tîne, girîngîya r'êya nû, ku ew k'etinê, mezintir dike.*<sup>1</sup> – Hema wisa!

Mirov nikare tê bigihîje, ev pêvajo dê çawa bikaribe bi mirovekî xwedî helwestek a vî r'engî r'a bimeşe? – Û, lewra jî, mirov dixwaze tê bigihîje, k'a, gelo, mirovek, ê ku bi xwe li hember net'ewekê t'êr'ora dewletê dimeşîne, û ew gel jî wek ku dikare li hember wê t'êr'orê ber xwe dide, dê bikaribe bi helwesteke weha vê pêvajoyê r'a, hîç nebe, gavekê jî biavêje? Ma ne, ew hewl dide, ku di ç'avê r'aya giştî ya cîhanê û gelê T'irkîyayê da pêvajoyê wek “*t'êkbirina t'êr'orê*” bide xuyan. Helbet, eger mabesta wî r'awestandîna, an t'unekirina t'êr'ora dewletê bûya, ya ku li hember gelê k'urd hatye û îro jî tê meşandin, wê demê dê gotina wî di cîh da bûya, lêbelê, ...

Û, binihêr'in, ne bes e, ku Erdoxan t'evgera net'ewekê, ya ku ew ji bo mafên xwe yê mirovî-net'ewî dimeşîne, t'êr'or nav dike, û pêr'a jî wê t'êkoşîna r'ewa û mafdar bi împêriyalîzmê va girê dide û dibêje, ku “*...ji t'êkbirina wê lîstîka veşartî û qir'êj, ku ev dused sal in, împêriyalîzm li vê erdnîgarîyê pêk tîne, ne t'enê welat û welatîyên wan, lê wisa jî t'evahîya herêma wan dê xêrê jê bibîne*”. – Ango, ew dixwaze bide bawerkirin, ku ew, ku di T'irkîyayê da ev dused sal e, li hember gelê k'urd t'evkujî, malwêranî, qedexa û înk'ar pêk hatine û îro jî pêk tîne, dewlwtên derva (bi devê wî – împêriyalîzm!) gunehk'ar in.

<sup>1</sup> <https://yandex.ru/video/preview/6198574711554002392>

Û li vira mirov dixwaze bangî cîhanê bike: “*Hûn dibihên? Ç’av û guhên xwe vekin, binihêr’in, k’a sultanokê nûpêk’etî we çawa û bi çi dixapîne!*”

Helbet, welatên bîyanî jî, wek dewlet, bi K’omara T’irkîyayê r’a di nava têk’ilî û hev-k’arîyan da bûne, û di têk’ilîyên dewletan da jî wijdan, exlaq, mirovî nînin, her tişt bazara berjewendîyan e – berjewendîyên dewletan. Lêbelê, ew *împêrialîzm*, a ku Erdoxan behsa wê dike, T’irkîyayê ji wê bêhtir sûd wergirtye, ne ku zyan dîtye! Ewê *împêrialîzmê* K’omara T’irkîyayê wek dewlet hinartye, ava kirye û hêz daye wê, heya ew anye-gîhandye asta îroyîn û kirye bela serê xwe. Ev K’omara, ya ku îro heye, projeyeke derva ye, bi sîmî hatye hinartin, lêbelê, wek ku tê go-tin, R’ojhilat xwedî t’aybetîyên tenik e, ji wê konglomêratê, ya ku di bin navê t’irkan û K’omara T’irkîyayê da hatibû hinartin, t’enê dikaribû sîstêmek a weha ya merivxur derk’eta holê.

Û – ya dinê jî: ev t’ewanbarkirina împêriyalîzmê ji hêla Erdoxan va bûyerên dîrokî yên sedsalekê berê nayne bîra we? – Di dema xwe da K’emal At’at’ûrk jî bi heman awayî K’omara Sovêtî ya R’ûsîyayê da bawerkirin, ku ew li dijî împêrialîzmê ditêk’oşe, lewra jî ew û R’ûsîya Sovêtî hevpeymanîyên hev ên xwezayî ne, û, wek îzbatî, heya k’umên leşkerî yên Art’êşa Sor (komûnarka) dan serê eskerên xwe, û ji R’ûsîyayê t’êra xwe alîk’arîya madî, leşkerî û ç’ekan stand, r’abû ser p’êyan... Piştr’a T’irkîya çawa bû endama NATO-yê, û îro jî endamake wê ya çawa ye, çawa bi hêzên cuda r’a bi durûtî şalûzetîyê dike û bi fêlbazî dilîze, li ber ç’avan e. Û piştî vê, ne bes e, T’irkîyayê bi erêkirina bêdeng a NATO-yê Qîbris dager kirye, di Bakûrê K’urdistanê da li hember gelê k’urd (hemwelatîyên xwe!) t’evkujîyan pêk tîne, hela serda jî, ji bo ku ji pêşk’ertinên Herêma Otonom a Başûrê K’urdistanê r’a bibe asteng û êrîşan bibe ser hêzên gêrêlayên azadîya net’ewî, ji çilî zêdetir baregehên xwe yên leşkerî-sîxurî li wir cîh kirye, bi r’ojane êrîşan dibe ser R’ojavayê K’urdistanê, li hember gelê medenî t’evkujîyan pêk tîne (dîsa bi erêkirina bêdeng a NATO-yê), û piştî ewqasî r’abûye û qala împêrialîzmê dike... Û ew împêrialîzm, a ku, bi gotina wî “... *ev dused sal in, lîstika veşartî û qirêj li vê erdnîgarîyê pêk tîne*”, dema Erdoxan (daîşî wî wek emîrê xwe nas dikin!) êrîşan dibe ser hevpeymanîyê wan ê di têk’oşîna dijî DAÎŞ-ê da, bêdeng dimînin, qadên hewayî ji bo êrîşên wî qedexa nakin.

De, îjar, dibêjin hevpeymanî...!

Û pirsê biratîyê!

Mirovek çawa dikare birayê yekî dinê be, dema ew heya navê wî jî qedexa dike, bi fîzîkî, bi çandî, bi bawerî û hemû t’aybetî û nîrxên xwezayî yên net’ewî va wî t’ûne dike? Helbet, gelê k’urd ne dijî biratîyê ye, lêbelê, biratîyeke çawa. Mirov çawa dikare birayê yekî be, yê ku wî t’ûne dike, ji hêlekê va ziman, k’en, girî, kevneşopî û hemû nîrxên wî yên net’ewî qedexa dike, lê ji hêla dinê va çand û hunera wî bi berekêva didize (bi devê yên wek Îbrahîm T’atîlîses!) û wek ên xwe nîşanî cîhanê dike?!...

Biratî di nava gelan da wê demê dikare pêkan bê, dema ew ji hêla mafên mirovî û net’ewî va wek hev bin, dema zar’okên wan di dibistanên xwe da ziman, wêje, çand û dîroka gelê xwe fêr dibin û bi wan p’erwerde dibin. An, na ..., dê yên wek wan netîştokan bigihîjin, ên ku îro wijdanê xwe kirine berîka xwe, r’ûmet, exlaq û namûsa xwe danîne bin p’ê xwe û li dora kujerên gelê xwe civyane ... !

Û ev r’êjîm, bi serokatîya mirovekî weha îro ewqas wêrekîyê ji k’u digire, ku PKK-ê piştî banga R’êber Ocalan agirbest daxuyandye (û ev jî, bi heşmendî mercê sereke ye, ji bo pêşk’ertina pêvajoya aşîyê!), bê navber bi t’undî êrîşên xwe li ser Herêma P’arastinê ya Medyayê û R’ojavayê K’urdistanê didomîne! T’enê hevtêya buhurî 828 êrîşê gokebaranî birine ser *Garê, Zapê, Xakûrkê, Ava Şîn, Metînan!*

Mirov vê çawa têbigihîje – k’a li vira heş û heşmendî?!

Lewra jî di nav gel da metirsîyek pêk hatye, û pirsên vî r’engî r’û didin:

– Îjar emê çawa bawerîya xwe li vê r’êjîmê û mirovekî weha bînin?

– Wê demê k’î yê me ji êrîşên wan bip’arêze?

– Me ewqas p’akrewan dane, û hemû destk’ertîyên gelê me îro girêfterî navê PKK-ê

ne!

– Ma, ewî mirovî, eger bi r’astî aştî û aramî bixwasta, dê tiştên weha bikira?

Bi r’astî, bi van pirsan r’a wisa jî li bal me gelek pirs û metirsî r’û didin, û emê li vira hewl bidin gav bi gav ewana jî r’ave bikin.

Divê di sêrî da hêzên hêgêmon ên cîhanê, sazî û r’êxistinên navnet’ewî, t’evahîya r’a-ya giştî ya cîhanê ji bo r’ast têgihîştin û ç’areserîya pirsgerêkên herêmê r’astîyekê bingeh bigirin, ew jî ev e: **pirsgirêka k’urdî ne pirs a ewlek’arîyê, an ewlehîya hinek r’êjîm û dewletan e, ew pirs a mafên r’ewa yên mirovî û net’ewî yên gelekî ye.** Û ev pirsgerêk divê ji vê hêlê va bê nixandî û ji bo ç’areserîya wê r’êyên pêwîst û guncav bên dîtin. **Divê bê zanîn: heya pirsgerêka k’urdî neyê ç’areserîkirin, di herêmê da nikare aştî û aramî hebe!**  
– Ev yek ji mercên sereke ye!

Û ya dinê jî – **dawîya dawîyê divê cîhan bibîne û bip’ejirîne, ku sedema van nak’okî, ser’ û p’evcûnan ne PKK ye, sedem r’êjîma fasîst a T’irkîyê ye, ya ku heya hebûna gelê k’ird bi xwe înk’ar dike (a 30 mîlîonî!), mafên wî yên mirovî-net’ewî binp’ê dike, li hember gelê medenî (jin, zar’ok, kal û pîr!) têr’ora dewletê dimeşîne û t’evkujîyan pêk tîne!**

**Ma, serhildanên Şêx Seyîdê, Seyîd R’îza, yên K’ocgîrîyê, Ararartê? Ma ew jî PKK-î bûne?... Ma, ew t’evkujî, yên ku evê dewletê di seranserê K’urdistanê da li hember gelê k’urd pêk anîne, ji bîra cîhanê cûne?**

Û T’irkîyayê PKK ji bo wê kirye armanc, lewra ku baş dizane, ku têk’oşîna wê ya ji bo mafên t’evahîya gelên K’urdistanê ya here mafdar û bi hêz e! Têk’oşîna wê ji bo mafên gelê k’urd û ên hemû gelên K’urdistanê yên net’ewî ye! Û r’êberî û serk’êşîya vê Daxweza Pîroz jî T’evgera R’izgarîya Net’ewî pêk tîne – bi r’êberîya bir’êz Ocalan!

Erê, dem hatine guhar’tin, û PKK jî divê di nava xwe da guhar’tin û veguhar’tan pêk bîne, û ev r’êyek a xwezayî ya her civakekê, her r’êxistinekê û her t’evgerêkê ye. Di dîrokê da mînakên wisa gelek hebûne... Û pêwîstîya van guhar’tin û veguhar’tinan t’u têk’ilîya xwe bi daxwezên r’êjîma T’irkîyayê r’a nîne. Ew pirsgerêkên her r’êxistinekê yên hindur’în in, ên ku ew bi xwe dikare ç’areser bike.

Piştî şkestina serhildanên destpêka sedsala bîstî gelê k’urd bi têk’oşîna vê T’evgerê jinûva di nava xwe da hêz û xwebawerî dît, vejîya, kirasê tires çir’and, û êdî bi dehan nivşên nû bi bîrdozî û bawerîya PKK p’erwerde bûne û gihîştine. Û îro ew êdî nîrxekî net’ewî yê giranbuha ye! Îro PKK ji bo gelê k’urd bûye wek nasnameyekê... Ji bilî wê ew bûye garantî û misogerîya t’evahîya K’urdistanê û k’urdistanîyan. Dema êrişên DAÎŞ-ê pêk hatin, k’ê ji bo gelê k’urd xwe feda kir – k’ê xwe bi Şengalê r’a gîhand, k’ê êrişên daîşîyan li ber dergehên Hewlêrê r’awestandî, k’ê bi gelê R’ojavayê K’urdistanê r’a t’evahî di Kobanîyê da piştî DAÎŞ-ê şkênand? – Her kes dê bibêje – PKK-ê!

Û lewra jî, ev emîrê DAÎŞ-ê yê ne formal tola xwe ji PKK-ê û gelê k’urd hiltîne, bi sedan çalakvan û siyasetmederên k’urd bi Doza Kobanîyê îro di girtîgehên T’irkîyayê da ne.<sup>2</sup> Ma R’NY û NATO evê yekê nabînin?!

Û ne pêkan e, ku bi daxweza hinekan evê nasnameyê bi pîvanên qîmetkirina r’êjîmekê, ya ku têr’ora dewletê li hember gelê k’urd dimeşîne, binirxînin û hema wisa bi hêsane qat bikin û daynin hêlekê... PKK ji bo destanîn û p’arastina mafên gelê K’urdistanê derk’etye, û ji bo vê têk’oşîyê dehê salan a bêhemp’a meşandye, mînakên lehengî û fedek’arîyên mezin daye, her destk’evtîyêke gelê k’urd di nava xwe da şopa PKK û lehengên wê p’arastye, lewra jî divê bi serbilindî û r’êzdarî nêzîkî nav û k’arên wê bibin, û derfet bên afirandin, ku ew di nava xwe da veguhar’tinan pêk bîne û mîssîona xwe ya dîrokî bi serfirazî bibe serî...

Yanê – na!...

Divê neyê jibîrîkirin, ku PKK bi dehhezaran p’akr’ewan dane – di herêmên Welêt ên cuda da Gor’istanên P’akrewanên wê hen, ên ku bûne pîrozgeh û sembola berxwedana gelê

<sup>2</sup> Di vê derbarê da hûn dikarin bi hûrbîni li vir bixwînin: “Cîhana sewdaser – doza Kobanîyê” – [https://amidakurd.net/ku/tekst/CĪHANA\\_SEWDASER](https://amidakurd.net/ku/tekst/CĪHANA_SEWDASER)

me. Di derbarê lehengîyên wan têk'osher'ên bêhemp'a da bi sedan destane hatine nivîsîn, belgefilm û filmên hunerî hatine k'ışandin, r'êzebergên (r'êzecild) berhemên R'êber Ocalan bi dehan zimanên cîhanê hatine weşandin û gelek kesên wan welatan piştî xwendina wan berheman êdî bi ç'avê Ocalan li buyer û pêvajoyên cîhanê dinihêr'in. Û ev dîrokek e – dîroka zêndî ya îro, ya ku bûye r'ênîşa pêşer'ojê (dihatûyê)... PKK mirovekî nû sêwirandye – û îro di t'evahîya K'urdistanê û derveyî Welêt da bi dehmiîlonan t'erefdarên wê hene.

Tê bîra we, xwendevanên hêja, di gotara xwe ya “R'êjîma baasî ya Sûrîyayê k'et – ev dawî bû, an – destpêk a nû?!” da min gotinên, dotek a gelê k'urd a hêja, Zozan Elûşê anîbûn. Ew dibêje: “... *gelo, eger PKK-ê xwe ji Sûrîyê kişand, ... dema mafên min, li wir (bên binp'ê-kirin), wê k'î min bip'arêze?*”<sup>3</sup> – Helbet, her çiqas, pirsaw ewlek'arîya k'urdên R'ojava hinekî cuda ye, li wira êdî art'êşek a t'am a bi r'êk û pêk heye (HSD), ya ku wisa jî di nava hêzên hevpeymanîya navnet'ewî da cîhê xwe digire, lê dîsa jî, herêma R'ojhilata Navîn t'aybetmendiyên xwe hene, û kes nizane, k'a sibê r'ewşê çawa bê guhar'tin... Lewra jî îro bi giranî di nava civaka K'urdistanê da PKK wek garantora mafên gelê k'urdistanîyan tê dîtîn, û ew jî ne ku t'enê ji hêla leşkerî va, lê her weha, ji hêla siyasî, dîplomasî, çandî, derûnî û r'uhe net'ewî va!

Naha dibe ku hinek bipirsin – lê banga R'êber Ocalan?

Û ewê mafdar bin. Lêbelê, li vira divê hinek r'astî li ber ç'avan bên girtin.

Di serî da divê bê zanîn, k'a k'î evê bangê çawa dibîne û çawa dixwîne.

Lewra jî divê bê gotin, ku ew manifestoyek e, ango, beyankirina (dêklarât'sîon) da-xwezîyên pêkanînan hinek pirsan e, yên ku ji hêla r'êvebirîya PKK-ê va bi têgihîştinî û r'êzdarî hatine p'ejirandin. Lêbelê, ji bo ku ew daxwezî bên pêkanîn, hinek mercên destûrî-qanûnî, dadmendî, t'evgerî-r'êxistinî pêwîst dikin, û di derbarê wan da jî di Banga bir'êz Ocalan da heye, lêbelê, mixabin, hinek vê nabînin...

Wek ku me êdî li jorê gotibû, divê Banga bir'êz Ocalan û Daxwîyanîya R'êvabirîya PKK-ê di nava çarç'oveyekê da bên nirxandin, lewra ku ew hevdu t'emam dikin. Bala xwe bidinê, di daxwîyanîya xwe da PKK-ê balê dik'îşîne ser wê, ku: *... di vê çarç'oveyê da, ji bo ku Banga R'êber Apo ya 'Aştî û Civaka Dêmokratîk' pêk were, ew ji îro pê ve agirbestê îlan dikin, û eger li hemberî wan êrîş pêk neyên, hêzên wan dê çalakiyên ç'ekdarî li dar nexin. Her wiha pêkhatina mijarên wek a ç'ekdanîne jî bes bi pêşengtiya pratîk a R'êber Apo pêkan e.*

Di daxwîyanîyê da her wiha tê gotin, ku ew amade ne, li gorî daxwaza R'êber Apo kongrêya partiya xwe li dar bixin, lê belê, ji bo pêkhatina wê divê şert û mercên guncav werin dabînkirin û ji bo serk'eftina kongreyê jî *divê R'êber Apo bi xwe ji kongreyê r'e pêşengtiyê bike û bi r'ê ve bibe. ... bes R'êber Apo dikare r'êveberîya Serdema Aştî û Civaka Dêmokratîk bike.*

Her weha di Daxwîyanîya PKK-ê da tê desnîşankirin, ku r'astiyên şênber p'ir' eşkere didin xuyan, ji bo Banga 'Aştî û Civaka Dêmokratîk' bi awayekî serk'evtî pêk were, *ji bo demokratîkbûna T'irkiye û R'ojhilata Navîn a li ser bingeha ç'areseriya demokratîk a pirsgerêka K'urd, ji bo pêşxistina t'evgera demokrasiya k'urevî, divê mercên R'êber Abdullah Ocalan bên mîsogerkirin, ku ew bikaribe bi awayekî fizîkî azad bijî û bixebite, hevalên wî jî di nav de, bikaribe bê astengî bi kesên ku dixwaze r'e têk'iliyan dayne. Em hêvî dikin ku pêwîstiyên vê yekê ji aliyê sazîyên pêwendîdar ên dewletê ve bên bicihanîn.*<sup>4</sup>

A, bi bingehîn, ev xal bûn, ên ku mirov dikaribû di Daxwîyanîya PKK-ê da cuda bikira.

Ango, ev mercên sereke ne, yên ku PKK daye pêş r'êjîma K'omarê, û ç'arenûsa vê pêvajoyê jî girêft'erî wê ye, k'a r'êvebirên r'êjîmê dê ji vir û pêva çî helwestê bidin xuyan û çî gavan biavêjin. Lê, wek ku li jorê hate gotin, R'eceb T'ayîb Erdoxan û xulamokên wî bi xewna “*hilweşandina dîwarên t'er'orê û împêrialîzmê*” r'adizên û r'adibin.

Daxwîyanîya Erdoxan, êrîşên bê r'awestan ên ser Herêma P'arastinê ya Medyayê û

<sup>3</sup> [https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R\\_ÊJÎMA\\_BAASÎ\\_YA\\_SÛRÎYAYÊ\\_K\\_ET\\_EV\\_DA\\_WÎ\\_BÛ\\_AN\\_DESTPÊK\\_A\\_NÛ](https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R_ÊJÎMA_BAASÎ_YA_SÛRÎYAYÊ_K_ET_EV_DA_WÎ_BÛ_AN_DESTPÊK_A_NÛ)

<sup>4</sup> <https://anfkurdi.com/kurdistan/pkk-ji-iro-pe-ve-em-agirbeste-ilan-dikin-194741>

R'ojavayê K'urdistanê (ew jî wê demê, dema piştî banga R'êber Ocalan PKK-ê agirbest r'agîhandye) jixwe helwest û armancên r'êjîmê didin xuyan.

Û ya here balk'êş jî ew e, herç'ên ku dipirsîn (k'urd, ne-k'urd, dost, ne-dost, ferq nake!), k'a, gelo, piştî Banga R'êber Ocalan ev pêvajoyê de çawa bimeşe û bi çi awahî encam bide, kesek nade ber ç'avan, k'a ew pêvajoyê çawa destpê bû<sup>5</sup>, k'a, gelo, di nava k'îjan çarç'oveyê da û çiqasî pêkan e, k'a ew r'ewş û merc, ên ku di wan da ev pêvajoyê destpê bûye, çiqasî bi dadmendî û qanûnî r'ewa ne, ku ji mirovekî r'ehîne girtî, yê 26 sal e, di nava t'ecrîda giran da, bangeke wisa bê xwestin?! Êdî em di derbarê mercên mirovî – fîzîkî, derûnî û t'endurustiyê da nabêjin... Lê, dîsa jî, ev r'êberê PKK ye, yê ku di nava mercên dîrokî yê here bêç'are û bêderfet' da r'êxistineke weha avakirye, û ev 50 sal e, têk'oşînek a bêhemp'a li dijî têt'ora dewletê dimeşîne, ew di nava van şert û mercan da jî dizane, k'a di cîhanê da û li dora me çi pêk tê, û ew divê çi binivîse, hema em, ên ku li derva, serbest û azad, di odeyên xwe yê germ da, di p'alk'ursiyên nerm da r'ûniştine, wan r'aman, dîtin û pêşbînîyên wî çawa dixwînin? – Ma ne, hema her tişt di wê da heye!

Dîsa divê tiştêk bê zanîn, ev têk'oşîna jî, ya ku r'ojên here teng û dijwar da li dijî têt'ora dewletê derk'etye, ne t'enê û ne ewqas ya ç'ekdarî bûye, çiqas ya bîrdozî, zanistî, r'uhî-r'e-wanî, r'amanî, t'evgerî, civakî, çandî û nîrxên mirovî-net'ewî bûye! Û ya ku Erdoxan û klîka wî (k'oma sûk'aran) ditirsîne jî, hema ev e.

Û di têk'oşîna xwe ya ji bo mafên gelê k'urd da PKK û R'êber Apo hîç carekê jî k'aranîna ç'ekan ji xwe r'a nekirine armanca sereke. Di r'ewşa têt'ora dewletê da ew pêngavek a mecbûrî bûye. Û hîç liv û t'evger û çalakîyêke PKK-ê li dijî gel û sazî û r'êxistinên medenî nînbûne...

Bala xwe bidinê, PKK hê sîh sal berê (24.01.1995) Peymana Jênêvayê (The Geneva Convention) ya di derbarê p'arastina mafên mirovan a di demên p'evçûnên ç'ekdarî da – leşker, hêsîrên şêr', yê birîndar û kesên medenî, îmze kirye, û di wê derbarê da li Jênêvayê di civîna çapemanîyê da r'agîhandye.<sup>6</sup> Û ew jî wê demê, dema r'êjîma T'irkîyayê hîç r'êzik û pîvanek a sazî, r'êxistin û peymanêke navnet'ewî ne dişopîne û ne jî cîh tîne.

Û li vira pirs dertê holê: Ew sazî û r'êxistinên navnet'ewî, û di serî da jî R'êxistina Net'ewên Yekbûyî, yê ku divê cîhanîna merc û pîvanên vê daxwîyanîyê bişopandana û, dema ku pêwîst bikira, desttêwerdanek pêk bîyanana, li k'u bûn û îro li k'u ne?

Lê di vê navberê da, yek e, r'êjîma faşîst bi siyaseta têt'ora dewletê û pêkanîna t'evkujîyan li hember gelê k'urd, wisa jî propagandaya r'eşkirinê ya qir'êj li hember p'arazvana mafên wî – PKK-ê û t'erefdarên wê dimeşîne.

R'êjîm her tiştî dike, ku siyaseta xwe ya dijmirovî li civaka cîhanê bide p'ejirandin û ferz bike.

Û li vira ya ku mirov matma dike, ew e, ku dewletên ewropî û DYA ji van derew, şer' û buxdanan bawer kirine û îro jî bawer dikin (!!) û bêyî r'ayê xwe dibin hev'ar û hev'arên wan sûcan, ên ku r'êjîma T'irkîyayê li hember mirovahîyê pêk ane û îro jî pêk tîne...

Bala xwe bidinê, her mînakê: dema r'êberê gelê k'urd Abdullah Ocalan li R'omayê bûye (s. 1998.), serokdewletê DYA yê wê demê Bîll K'linton ji serokwezîrê Îtalîyê Massimo D'Alêma r'a t'êlêfon dike û jê dixwaze, ku ew Ocalan r'adestî T'irkîyayê bike.<sup>7</sup> Û, dema ev yek ji wan r'a li hev neyê, ew bi dek' û dolab (komplo), bi korsanî r'êberê gelê k'urd digirin û r'adestî r'êjîma faşîst kirin. K'a, ji k'erema xwe r'a bibêjin, eger ev ne cerdevanîya navdewletî ye, lê çi ye?!

---

<sup>5</sup> Di vê derbarê da me nêrîna xwe di gotara berî vê da êdî anye zimên: *R'ewşa Sûriyayê piştî têt'çûna r'êjîma BAASî, pîrsgirêka k'urdî û r'êyên c'areserîya wê!* – [https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R\\_EWŞA\\_SÛRİYAYÊ\\_PİŞTÎ\\_TÊK\\_ÇÛNA\\_R\\_ÊJÎMA\\_BAASÎ\\_PIRSGIRÊKA\\_K\\_UR\\_DÎ\\_Û\\_R\\_ÊYÊN\\_Ç\\_ARESERİYA\\_WÊ](https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R_EWŞA_SÛRİYAYÊ_PİŞTÎ_TÊK_ÇÛNA_R_ÊJÎMA_BAASÎ_PIRSGIRÊKA_K_UR_DÎ_Û_R_ÊYÊN_Ç_ARESERİYA_WÊ)

<sup>6</sup> <https://www.ozgurpolitika.com/haber-pkk-1995ten-beri-cenevreye-uyuyor-10455/>

<sup>7</sup> <https://anfkurdi.com/ewropa/massimo-d-alema-dem-hatiye-ku-mafen-kurdan-bene-naskirin-194706>

Lêbelê, her çiqas, hinek dewletan “piştgirîya” xwe ji bo r’êjîma T’irkîyayê dane xuyan jî, di dadgehên cuda yên navnet’ewî da li dijî wê gelek doz hatine vekirin – ji bo sûcên wê (cinayet) yên cuda û bînp’êkirina mafên mirov ji hêla wê va. Û ji wan dozan gelek hatine qazenckirin, hinek jî hê di pêvajoya lêpîrsînê da ne.

Lê hîç xema T’irkîyayê nîne, lewra ku xwedîyên wê yên bi hêz û bandor û hinek sazî û r’êxis-tînên navnet’ewî yên cuda hene, yên ku amade ne, di xizmeta wê da bin ...

Lêbelê, cîhan tê veguhar’tin. Bi gavne biç’ûk û hêdî, ... lê tê veguhar’tin. Û gelê k’urd jî bi têk’oşîna xwe ya mafdar û r’ewa k’eda xwe dike nava van veguhar’tinan.

Û agahîyek a balk’êş jî: dozgera berê ya Dadgeha navnet’ewî (*International Tribunal*) ya R’êxistina Net’ewên Yekbûyî (R’NY/UN) *Kar’la dêl Pontê* cotmeha sala 2019-an bang kiribû, ku Erdoxan di Dadgeha Haagayê da darizînin. Di banga wê da bi t’aybet dihat gotin: **“Erdoxan xaka Sûrîyayê dager kirye, ji bo ku k’urdan t’une bike. Ev nayê p’ejirandin! Divê li hemberî wî lêpîrsîn bê destpêkirin. Erdoxan divê ji bo pêkanîna sûcên leşkerî bê darizandin. Divê destûr neyê dayîn, ku ew ji wî r’a bimîne. K’urdên Sûrîyayê û T’irkîyayê di bin t’ehdîd û metirsîyên ciddî yên r’êjîma Ankarayê da ne”**.<sup>8</sup>

Û ya here girîng! Dadgeha bilind a bir’yarguyêr’ a Bêlgîyayê 28-ê r’êbendana sala 2020-î di Brûksêlê da bir’yara Dadgeha venêr’înê ya adara sala 2019-an a di wê derbarê da erê kirye, ku *Partîya K’arkerên K’urdistanê r’êxistineke têr’orîstî nayê hejmartin, lê wek t’erefekî p’evçûnên ç’ekdarî tê dîtin*. Jixwe du hevtîyan berî vê biryarê serdozgerê Dadgeha biryarguhêr êdî nêr’îna xwe ya erênî di vê derbarê da gotibûye.<sup>9</sup>

Û, ya dinê, 10-ê cotmeha sala 2020-î wek R’oja têk’oşîna ji bo Azadîya R’êber Ocalan hatye r’agîhandin.

R’êzek r’ayedarên navdar ên siyasî li seranser Ewropayê (ji Welatê Baskan heya Brîtanîya Mezin!) p’eyamên xwe yên vîdeoyî şandibûn, û di wan da bang kiribûn, ku dawî bi goşangîrîya (t’ecrîd) bir’êz Ocalan bê anîn.

Lê, endama Baskê Jorîn ê Parlamêntoya Brîtanîyayê (Seraya Iordan), nûnera lêyborîstan û hevseroka T’avgera “Azadî ji bi Ocalan” *K’rîstîn Blowêrê* daxwîyandibû: **“Em piştgirîyê didin wan, ên ku banga azadîya Ocalan dikin, lewra ku em bi bawer in, heya Ocalan cîyê xwe yê ji hêla hemû mafan va misoger negire, pîrsgirêka k’urdî dê ç’areser nebe”**.<sup>10</sup>

Ev – ji bo têgihîştin û wat’edarkirina pîrsgirêkê bi giştî!

Û, piştî wan dane, delîl û agahîyan, ên ku me li jorê anîn û nirxandin, mirov dikare ji bo vê pêvajoyê çi bibêje?

Helbet, eger r’êvebirîya T’irkîyayê van êrîşên xwe r’awestîne, helwest û zimanê xwe biguhêr’e, bi heşmendî û têgihîştinî nêzîkî vê pêvajoyê bibe, û R’êber Ocalan bê azadkirin, wê demê dê di navbera R’êjîmê û PKK (T’erefê k’urd) da bikaribe dîalogek pêk bê, dê bikaribin, r’ewşa K’omarê bi giştî binirxînin û bi hev r’a r’êyeke ç’areserîyê ji pîrsgirêkên vî welatî r’a bibînin. Û, eger di vê çarç’oveyê da, bi r’êform û veguhar’tina sîstêma dewletê di vê k’omarê da mafên gelê k’urd û gelên dinê bi destûrî bînin misogerkirin, t’u t’ehdîd û metirsî ji bo gelan nemîne, wê demê, jixwe, dê pêdivî bi ç’ekan nemîne. Û piştî wê PKK dikare Kongrê xwe lidarbixe û bir’yarên pêwîst bigire.

Ango, eger bi destûrî sîstêma dewletê ya ûnîter a bi qanûn û pîvanên dijmirovî bê veguhar’tin, sîstêmek a nû bê hîlbijartin, dewlet bibe a gel, t’ehdîd û metirsî ji holê r’abin, wê demê dê pêdivîya gel bi ç’ekan nemîne. Her piştî vê!

Em bi bawer in, piştî ku ev hemû pêk bînin, pîspor-dîrokzan, dadzan û siyasetzan dê

<sup>8</sup> <https://eadaily-com.turbopages.org/eadaily.com/s/ru/news/2019/10/27/karla-del-ponte-prizyvaet-sudit-erdogana-v-gaagskom-tribunale>

<sup>9</sup> <https://anfrussian.com/Новости/Вердикт-бельгийского-суда-в-отношении-РПК-может-стать-прецедентом-18379; см. также: «Дело РПК в суде Бельгии прекращено». – https://anfrussian.com/Новости/Дело-РПК-в-суде-Бельгии-прекращено-17949 и «Рим выступает за свободу Оджалана» – https://anfrussian.com/Новости/Рим-выступает-за-свободу-Оджалана-8797>.

<sup>10</sup> <https://anfrussian.com/Новости/От-страны-басков-до-Великобритании-в-поддержку-Оджалана-24582>

hem sîstêma dewletê, encamên r'êvebirîya wê, hem jî ya PKK, û praktîka wê ya têk'oşîna ji bo mafên gelan, wek r'êxistinek a siyasî, bi obyektîvî bên nîrxandin û wat'edarkirin.

Lêbelê, heya bigihîje wê demê, wek ku tê xuyanê, hê demek me divêt...

Naha pirs di wê da ye, k'a, gelo r'êvebirên vê r'êjîmê dê helwest û zimanê xwe bigu-hêr'in (hîç nebe!)? An-na, bi ferzkirina ç'ekberdanê û xwefeshkirinek a bê garantî, dema herr'oj ji hêla dewletê va êrîş û fişarên çekdarî gur'tir dibin, ev pêvajo çawa dikare bimeşe?

Di vê pêvajoyê da helwest û hewlên Meclîsa T'irkîyayê û partî û r'êxistinên wî jî girîng in. Divê civaka T'irkîyayê jî bi derûnî bê amadekirin, lewra ku, ev êdî sed salî zêdetir e, nivş bi nivş mejîyê wê ewqasî t'evlihev kirine, tovên bêtehmûlîyê, siddetê, nîrx û pîvanên dijmi-rovî di zar'oktîyê da di r'uh û mejûyê wan da ewqas çandine, ku gel bi xwe jî di navberê da maye.

Wek ku tê xuyan, divê di bin sîwana R'êxistina Net'ewên Yekbûyî (R'NY) da ji kesayetîyên mafap'arêz, dadzan, civaknas û siyasetzan komîsîonek a navnet'ewî bê avakirin, a ku sedem û bîngehên obyektîv û sûbyektîv ên vî şer'î bi dîrokî binîrxîne, û r'ê û r'êbazên ç'areserîya wan nak'okîyan bibîne, yên ku dibin sedemê şer' û p'evçûnan...

Û ji bo ku ev pêvajo bi encamên erênî her'e sêrî, divê ew di bin ç'avdêrîya R'êxistina Net'ewên Yekbûyî da bimeşe, divê mîmarê wê – r'êberê gelê k'urd bir'êz Ocalan û hemû girtîyên siyasî (r'ehîneyên sîstêma sûck'ar!) bên azadkirin, komîsîonek a navnet'ewî ya t'endurustp'arêz bê amadekirin (dîsa di bin sîwana R'êxistina Net'ewên Yekbûyî /R'NY da!), ji hêla wê va t'endurustîya bir'êz Ocalan bê venihêr'tin (kontrolkirin) û ji bo dasekinandina (r'êabîlîtat'sîon) t'endurustîya wî merc û derfetên pêwîst bên afirandin, lewra ku mirovekî 26 salan wek r'ehîne di girtîgehê da di mercên t'ecrîda giran da mabe, ji bo ku bikaribe, wek ku tê xwestin, Pêvajoya Aştîyê r'êve bibe, t'endurustîya fizîkî pêwîst dike.

Di vê pêvajoyê da, helbet, erk'a r'ewşenbîrên T'irkîyayê jî girîng e, yên ku nûnerên r'astîn ên wijdan, r'uh û r'ewan û r'amanên gel bi xwe ne, lêbelê, ji talebextan r'a, hîç demekê jî dengêkî wêrek ji wan dernek'etye.

Hê huvdeh sal berê (16. 10. 2008) min ji r'ewşenbîrên T'irkîyayê r'a nameyeke vekirî li ser wê r'ewşê nivîsî bû, ya ku li Bakûrê K'urdistanê û T'irkîyaê desthilatdar e, û bi t'aybet jî bala wan k'işandîbû ser t'ecrîda nemirovî ya li hember r'êberê gelê k'urd bir'êz Abdullah Ocalan... Wê demê min ew name bi dehan kesayet û sazî û r'êxistinên cuda r'a şandin. Ji bilî wê ew bi zimanên t'irkî û k'urdî di malp'era “Mêzopotamya” da ([www.mezopotamya.gen.tr](http://www.mezopotamya.gen.tr)) hatibû weşandin (ev malp'er dê paşê ji hêla r'êjîmê va bê girtin!). Me xwestibû, dengê xwe bigihînin hest û r'amanên mirovî yên wan r'êzdarên, lê dengê ji wan dernek'et. Helbet, em tê digijin, di r'ewşeke weha ya vî welatî da, dema her dengêkî azadîyê tê t'episandin û fetisandin, ewana nikaribûne dengê xwe bilind bikin, lewra ku li xwe û malbetên xwe fikirîne... Lêbelê, dibe ku ewana tê jî negihîjtine, ku ewana bêyî r'ayê xwe bi wê bêdengîya xwe pêkanînen r'êjîmê yên dijmirovî erê kirine... Weha, p'arçeyek ji weşana duyem a wê nameyê:

*“... Ev r'ewş, a ku li Bakûrê K'urdistanê û hemû K'omara T'irkîyayê îro desthilatdar e, nikare t'u mirovekî xwedî wijdan û r'ûmeta mirovî bêt'eref û bêdeng bihêle. Ew tiştê ku di dewleta we da pêk tê, bi r'astî, şerma mirovahîyê ye – ev bêdadî, ya ku li hember gelê k'urd tê pêkanîn, ev têr'ora dewletê, ya ku di K'urdistanê da tê meşandin, sert'aca nemirovaya mirovahîyê ne û ji bo wê jî, ne t'enê hûn, r'ewşenbîrên t'irk dê paşê şerm bikin, lê her mirovek, ê ku xwe mirov dhesbîne. Ev êrîş – opêratsîon, ên ku di K'urdistanê da tèn meşandin, ev t'evkujîya sipî, ya ku mil bi mil bi t'evkujîya sor r'a li hember gelê k'urd û r'ewşenbîr û siyasetmederên wî tê meşandin, ev t'ecrîda nemirovî ya li hember r'êberê gelê k'urd bir'êz Abdullah Ocalan tê pêkanîn, ev zar'okên girtî, yên ku sûcê wan ê herî mezin ew e, ku kevir avîtine tank û p'anzêrên art'êşa dagirker, ev grievên birçîbûnê, yên ku berbi mirinê va dibin – ev hemû sûcê dijî mirovayê ye, yê ku r'êjîma desthilatdar a K'omara T'irkîyayê pêk tine...”*

Ev nameya di p'irtûka me ya “Abdullah Ocalan. R'amana azadîyê, gelê k'urd û cîhan”. da jî hatye weşandin, yên ku bixwazin bixwînin – k'urdîya wê di r'ûpelên 79 – 84-an da ye, lê ya t'irkî – di r'ûpelên 96 – 101-î da.<sup>11</sup> Hem jî, dê baş bibûya, eger şewazê wê yê t'irkî bi

<sup>11</sup> [https://amidakurd.net/ku/tekst/ABDULLAH\\_OCALAN\\_Ramana\\_azadîyê\\_gelê\\_kurd\\_û\\_cîhan](https://amidakurd.net/ku/tekst/ABDULLAH_OCALAN_Ramana_azadîyê_gelê_kurd_û_cîhan)



awayekî dîsa bigihîšta bala r'ewşenbîrên t'irk...

Wekî dinê, dema mirov van hemû dane, agahî, bûyer, kiryar, helwestan analîz dike, tê ser wî nêr'înê, ku bêyî mudexeleya sazî û rêxistinên navnet'ewî, dewletên mezin ên bi bandor û hêgêmon, di bin sîwana R'NY da, ev pîrsgirêk bi daxwez û helwestên îdêolog, r'êvebir û r'ayedarên vê r'êjîma dijmirovî dijwar bikaribe bê ç'areserkerin (êrîşên wan ên li ser Bakûr û R'ojavayê K'urdistanê û daxwîyanîyên wan ên piştî banga R'êber Ocalan û agirbesta PKK vê yekê didin xuyan!), lewra jî, wek ku tê xuyan, pêwîstî bi dadgeheke navnet'ewî ya wek a Nyûrinbêrgê (1945–1949) heyem ya ku bikaribûya r'êvebir û r'ayedarên vê r'êjîmê darizandana<sup>12</sup> – ji xwe pêşniyara r'êzdar Karla Dêl Pontê êdî heye, me li jorê behsa wê kiribû...

Û têbînîyek jî: li vir û wir di medya civakî da di derbarê wî fotoyî da tê goftûgokirin, ê ku bi Banga R'êber Ocalan r'a hatibû weşandin. Gelek balê dikişînin ser wê, ku ew ne ku wêneyekî rastîn e, lê fotoşop e. Wêne di destpêka beşê yekem ê vê gotarê da ye, me ew ji ANF-ê hildaye.<sup>13</sup> Bi r'astî, di destpêkê da me zêde guh neda wan gotinan, me digot – de wêneyek e, ji bo Bangê amade kirine. Lê paşê hevpeyvîna yek ji siyasetmederên kevn û damezirênêrê AKP-ê, serokê demekê yê Meclîsa T'irkîyayê Bülent Ar'înc ber çavê me k'et. Ew hevpeyvîn di Hewlêrê da têlêvîzîona “R'ûdaw”-ê pêk ane... Dema di wê hevpeyvînê da gotin tê ser wê, ku, eger siyasetmederekî mîna Dewlet Baxçelî daxwîyandye, ku bila Ocalan bê di Meclîsê da biaxive û bang bike.... wê demê ji bo wê bingehek hebûye, Bülent Ar'înc dibêje: “*Min jî wisa bawer dikir, ku tiştêkî dizane. Ew tiştê ku Dewlet Baxçelî di pişt p'erdeyê da zanibû, ew beyannameya Ocalan bû, lê bêyî hazirîya wî bi xwe û t'enê bi wêneyekî. Dibe ku bi dengê xwe jî berg xwendibe. Îjar nizanîm, gelo, heşê hinartî (yapay zeka) têda hatibû k'aranîn, an – na! Bi her awahî, beyannameya xwendî erênî ye*”.<sup>14</sup> – Ev çî ye, mirov evê çawa tê bigihîje, Ar'înc ne siyasetmederekî nû yê bê t'ecrûbe û xişîm e, û tiştê weha dibêje?! Û ya balk'êş jî ew e, ku ew wê hevpeyvînê nade çapemenîya T'irkîyayê, lê diçe Hewlêrê û didê têlêvîzîonek a k'urdî. Û ya wî wêneyî jî, ê ku me besa wî kir, balk'êş e, pêwîst nake, ku mirov pisporê dîzayn û fotoşopê be, her tişt li ber ç'avan e. Qaşo, sazîyên t'aybet bi wan k'aran r'a p'ewendîdar in. Lêbelê, mirov matma dibe – gelo ev ji amatoriya wan tê, yan p'arçeyekî listikên r'êjîmê yên qirêj e? Çima? Mabest çî ye? R'êjîm bi vê dixwaze di nava gel û r'aya giştî da bêbawerîyekê biçîne, an bi r'astî hinek listik hene?!

Bila listikê r'êjîmê yên qir'êj ji wê r'a bimînin, lê pêvajoyê êdî navnet'ewî bûye û dimeşe. K'a, em bendê bin!

Dema ev gotar êdî amade bû, di çapemenî û medya civakî da agahîyek di wê derbarê hat belavkirin, ku Dewlet Baxçelî li dijî agirbesta PKK-ê derk'eteye, gotye, ku ew tu agirbrstan qebûl nakin, divê hemû k'omên ç'ekdar ên PKK-ê ç'ekên xwe bînin û r'adestî r'êjîma wan bikin. Ewî wisa jî gotye, ku divê YPG jî ç'ekên xwe bîne r'adest bike...

Bi r'astî mirov matma dibe: ev mirovana di cîhaneke dinê da dijîn, an pîrsgirêkên wan ên têgihîştinê hene? Bi xwe pêşniyar kiribû, ku bila Ocalan bê di Meclîsa T'irkîyayê da bi-axive û ji wir bang li PKK-ê bike..., naha jî ev gotinana.

Ev ne ciddî ye, wek ku tê xuyan, divê Şêwra Ewlek'arîyê ya Net'ewên Yekbûyî p'eywira xwe ya r'ewa pêk bîne û evê pîrsê di civîna xwe ya t'aybet da bike mijara nirxandinê, û ji bo misogerîya pêvajoyê gavên pêwîst biavêje...

---

<sup>12</sup> Bi hûrbîni di derbarê vê pêşniyarê da di gotara me ya “R'ewşa Sûriyayê piştî têkçûna r'êjîma baasî, pîrsgirêka k'urdî û r'êyên ç'areserîya wê!” da – [https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R\\_EWŞA\\_SÛRÎYAYÊ\\_PİŞTÎ\\_TÊKÇÛNA\\_R\\_ÊJÎMA\\_BAASÎ\\_PIRSGIRÊKA\\_K\\_UR\\_DÎ\\_Û\\_R\\_ÊYÊN\\_Ç\\_ARESERÎYA\\_WÊ](https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R_EWŞA_SÛRÎYAYÊ_PİŞTÎ_TÊKÇÛNA_R_ÊJÎMA_BAASÎ_PIRSGIRÊKA_K_UR_DÎ_Û_R_ÊYÊN_Ç_ARESERÎYA_WÊ)

<sup>13</sup> <https://anfkurdi.com/Cand-U-huner/ji-reber-apo-banga-asti-u-civaka-demokratik-194685>

<sup>14</sup> Hevpeyvîn bi tirkî: <https://www.youtube.com/watch?v=MOTF3188-Io> û bi kurdî: <https://www.youtube.com/watch?v=QwW1HSvc7nY>

## 2. K'OMARA SÛRÎYAYÊ PIŞTÎ ESED, HEWLÊN HTŞ-Ê Û PIRSGIRÊKA K'URD...



Berî ku li ser r'ewşa Sûrîyayê ya îroyîn, hewlên HTŞ-ê û pirsgerêka k'urdî di wê komarê de da r'awestin, em t'evkujîya li hember civaka elewîyan, a ku li Latakîyayê (Lazikîyê), Tartûsê û deverên dinê yên beravên Sûrîyayê pêk hatibû, bi t'undî şermezar dikin, xemgîniya xwe dyar dikin û serxweşîyê didin malbetên wan.

Divê ew k'om û r'existin û kes, ên ku ev sûcê giran pêk anîne, bên dîtin û anegorî qanûnên navnet'ewî bên cezakirin. Divê civaka navnet'ewî qîmetekî wat'eyî bide vê bûyera dijmirovî, a ku bûye sedema qet'ilkirin bi hezaran mirovên medenî yên bê sûc û guneh.

Ev jî, wek holokosta li hebaer gelê cihûd, t'evkujîyên li hember gelê k'urd ji hêla K'omara T'irkîyayê va û k'îmîabarabkirina bajarê Helebçê ji hêla r'êjîma Seddam Huseyn va pêkanînek a r'eşkujîyê ye, û em hêvîdar in, ku ewê ji hêla civaka navnet'ewî va ne ku t'enê li ser astên cuda bê şermezarkirin, lê her weha, dersek jê bê derxistin, ji bo ku di cîhanê da êdî bûyerên vî r'engî pêk neyên!

Naha em bên ser r'ewşa îroyîn a K'omara Sûrîyayê, hewlên HTŞ-ê û pirsgerêka k'urdî.

Me di derbarê r'ewşa destpêkî ya Sûrîyapiştî têkçûna rêjîma Esed di gotar xwe ya “R'ewşa Sûrîyayê piştî têkçûna r'êjîma baasî, pirsgerêka k'urdî û r'êyên ç'areserîya wê” da hinek nirxandin pêk anî bûn, di nava wan da, wisa jî, bi t'aybet, di derbarê HTŞ-ê da. Ên ku bixwazin, dikarin bixwînin.<sup>15</sup>

Bi r'astî, piştî vê, ya ku di Sûrîyayê da pêk dihat, di serê mirovê t'endurust û li ser heşê xwe da cîh nedibû. Van k'om û komikên el-qaydayî (û piranîya wan jî – ji derva hatî!), dema hatin û li ser k'ilafeyên (xerabe) r'êjîma Esed r'ûniştin, ji xwe r'a peywir di nava hev da p'arvekirin, xwe xwedîyên vî welatî daxwîyandin, piştr'a hemû sazî û dezgehên berê yên dewletê betal kirin, Kongrêya Nîştîmanî ya Sûrîyayê li dar xistin, komîsîonek ji bo amadekirina Destûra bingehî li hev berev kirin, lê, wek ku bibêjî, k'urd li wira nînin, ew venexwandin (helbet, eger di demên weha da vedixwînin) ... Em çî ji we veşêrin, xwendevanên hêja, me got, qey ya xêr ev e, evan “xwedîyên” nû yên Sûrîyayê bêyî r'ayê me, me-kurdan derî Sûrîyayê dihêlin û “neç'arî” serxwebûnê dikin?!

<sup>15</sup> [https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R\\_EWŞA\\_SÛRÎY\\_AYÊ\\_PIŞTÎ\\_TÊK\\_ÇÛNA\\_R\\_ÊJÎMA\\_BAASÎ\\_PIRSGIRÊKA\\_K\\_UR\\_DÎ\\_Û\\_R\\_ÊYÊN\\_Ç\\_ARESERÎYA\\_WÊ](https://www.amidakurd.net/ku/tekst/R_EWŞA_SÛRÎY_AYÊ_PIŞTÎ_TÊK_ÇÛNA_R_ÊJÎMA_BAASÎ_PIRSGIRÊKA_K_UR_DÎ_Û_R_ÊYÊN_Ç_ARESERÎYA_WÊ)

Û me amadekarîyên xwe dikirin, ku li ser vê r'ewşê nirxandinekê pêk bînin, dema di ajansên nûçeyan da agahîyek hat belavkirin, ku Femandarê Giştî yê HSD-ê Mazlûm Ebdî û serkk'omarê demkî yê Sûriyayê Ahmed aş-Şaraa peymanî di navber HSD-ê û hukumeta demkî ya Sûriyayê da îmze kirine.<sup>16</sup> – Bi r'astî, wek ku di nava gel da tê gotin, *şemî berî îniyê hat!*

Û dest bi govtûgo û gengeşîyên cuda bû, hinek xwendevanên me, welatp'arêzan û dost û hevalan t'êlêfon ser têlêfonê dikirin, dipirsîn, hestên wan heya r'adeyekê fûr didan, hinekan dixwastin tê bigihîjin, hinek jî k'etibûn bin bandora hinek şiroveyên çewt û bê bingeh ên provoyarîv. Û, Lewr jî emê li vira, bêyî ku pirsan destnîşan bikin, di vê derbarê da hinek şiroveyan bidin.

Di sêrî da, divê bê zanîn, ku, anegorî heş û heşmendîya p'êwendîyên navdewletî, peymanên vî r'engî hema wisa, bi carekê r'a di nava r'ojekê da nayên amedekirin, nirxandin û îmzekirin. Ji bo amadekirina dokûmênteke weha, kêmî-kêm mehek pêwîst dike, eger ne zêde. Di sêrî da di navera t'erefên siyasî da hevdîtin pêk tînin, ewana goveka (çarç'ove) û kontsêpta berjewendîyên sereke yê t'erwşefan destnîşan dikin, paşê pisporên cuda yê herdû alîyan li ser bingeha konsêpteke hevbeş tîk'ista wê amade dikin, piştr'a ew k'omên pisporan wan herdû nimûneyan bi hev r'a dinirxînin (û, divê bê zanîn, ku ew di odeyekê da, heya di bajarekî an herêmekê da rûnenişti ne!), piştr'a berpîrsên sereke wê dinirxînin, şewra xwe hinek der-doran dixin, paşê r'oja îmzekirina wê belgeyê tê destnîşankirin... Wisa, ku, dema amadek'arîyên vê peymanê hatye kirin, hê kesekî nizanibûye, dê ew trajêdîya di herêmên elewîyan da pêk bê... Erê, hemû ji bo vê t'evkujîyê xemgîn û dilkovan in, lêbelê, ji bo ku bersîva wan bê dayîn, divê hemû hêzên Sûriyayê îro hêz û derfetên xwe bigihînin hev û li ser vî derdê pêkhatî r'awestînin, û ev jî, ne ji bo xatirê aş-Şaraa, ne jî ji bo xatirê hukumeta demkî, ew îro hene, dê sibê nînbîn... Pirs di wê daye, ku mafên hemû pêkhatîyan bînin misogerkirin, û ji bo wê jî hêzeke bi r'êxistinî r'êkûpêk divê di nava wan sazî dezgehên da hebe, ên ku dê bir'yarên çarenûsî ji bo Sûriyayê bigirin. An – na, eger mirov ji bo hinekan ji pêkanîna erk' û p'eywirên xwe bixeyîde, dê li k'uva her'e?! Hema ji bo vê divê hêzên R'ojavayê K'urdistanê û Bakûr-R'ojhilatê Sûriyayê evê pêvajoyê bi serê xwe nehêlin, ew divê gotina xwe bibêjin, û ji bo wê, ku bikaribin gotina xwe bibêjin, divê di nav pêvajoya dewletbûnê da bin, û ew jî, ne ku wek sêwîyekî vexwendî, lê wek xwedîyekî vê dewletê yê bi mafên r'ewa va misoger, û divê ew hemû bi hêz û hewlên hevbeş wê dewletê avabikin...

Ev wek prînsîp ji bo tîgihîştina pîrsê!

Wekî dinê şiroveyên kes û sazîyên p'êwendîdar dê evê r'ewşê bêhtir r'ave û zelal bikin.

Lê emê evê peymanê bi r'êya HDS-ê û R'êvebirîya Xweser a Bakûr-R'ojhilatê Sûriyayê li t'evahîya gelê Sûriyayê pîroz bikilin û çend tîbînîyên xwe di derbarê wê da li vira bînin:

– bi vê peymanê r'ê li ber hêzên k'urdî û hevalbendên wan ên di Herêma Xweser da (ereb, asorî, ermenî û yê dinê) vedibe, ku ew bi hemû hêzên xwe va beşdarî avakirina dewleta xwe bibin;

– dema Herêma Xweser dibe p'arç'eyekî xweser ê K'omara Sûriyayê, HSD jî dibe sazîyek a p'arastinê ya Wezareta Beravanîyê ya Sûriya nû, wê demê, eger rêjîma T'irkîyayê êrîşê bîne ser wan, ewê bê wat'eya ku êrîşê tîne ser dewleteke sûvêrên (serbixwe) – Sûriyayê. Û wê demê êdî R'NY û dewletên dinê dikarin mudexele bikin;

– HSD êdî bi hêsane dikare k'urdên herêmên dinê yê Sûriyayê (yê wê Helebê) ji êrîşê ç'ekdarên r'adîkal bip'arêze, wek pîrsgirêka Sûriyayê ya hindur'în...

Û ev û hemû xalên dinê yê wê Peymanê dê di bin ç'avdêrîya komîsîoneke taybet da gav bi gav heya dawîya salê pêk bînin û bik'evin jîyanê ...

Em bendê bin!

<sup>16</sup> <https://anfkurdi.com/rojawa-sUriye/mazlum-ebdi-u-colani-peyman-imze-kirin-195117>